OSMAN SEBRÎ

# *BAHOZ*

û

Çend nivîsarên din



**Apo Osman Sabri**

Bahoz, first electronic edition

By

Kurdish Museum, Library and Archive

London 2015

Telephone: 00442087487874
Mobile: 00447768266005

e-mail:
info@westernkurdistan.org.uk
www.westernkurdistan.org.uk

# B A H O Z[1]

Wa ha!
Va ye hat ba!
Cihan tev bû sefma.
Hu... v...
Hu... v...
Geh bayê reş,
Geh bayê kurr,
Çiya.
Neval,
Zimag
Bi hev re yekdeng
dil in gurregurr.
Du bayên tûj
Du bayên sar
Radihêjînin

(1) Bahoz: bayê pirr xurt

Giya û dar.
Hu... v...
Hu... v...
Yek ewran dicivîn,
Ê din ji hev dirrevin,
Dikin şerr,
Bi awirr.(1)
Yek hûye Hurmiz(2)
Rûgeş û li ken.
Ê din bêmirês
Wekî Ehremen.(3)
Li rûyê erdê,
Di nava ezmên
Ewrên reş,
Ewrên gewr,
Rast û çep
Diçin tên.

---

(1) Awîrr: nêhrrîna bi xeyd û heybet
(2) Hurmiz: Xudayê xêrê li nik Zerdeştiyan
(3) Ehremen: Şeytan li nik zerdeştiyan

Herdu bayên ħa,
Bi xurtî û şîn
Heydî kol dikin
Wek du dêwên dîn
Herdu ba,
Bi vî ħalê ha,
Dikin şerr,
Dikin ceng.
Dinya ser û bin,
Hawîr bûye deng.
Guvvîn...!
Gujjîn...!
Gurmîn...!
Diheje cihan,
Diheje zemin.

* * *

Bayê kurr,
Ji bakurr,
Bi leşkerekî xurt,

Leşkerekî gurr,
Bi pêllan,
Bi killan,
Dajo ser neyar,
Wekî gurê har
Da ku bi derxe
Di nav cih û war.
Dikin şerr,
Dikin ceng.
Gujjin...
Guvvîn...!
Gurmîn...!
Ji her alî deng.
Ji her alî şîn;
Holê bi xurtî,
Bi zirt û halan
Ew rûyê erdê
Her dikin talan.
Şopa wan xopan,
Şopa wan bi xwîn.

Şûna tajangan
Tev dibe birin.

* * *

Tertilî Hurmuz
Ji ber Ehremen;
Derket ji qatê
Hê jî rû li ken.
Sist bû bayê reş
Derket ji meydan.
Bayê kurr bi zor
Himbêz kir cihan,
Bakurr
Wergerrî
Holê bû Bahoz.
Cihan
Seraser
Bû dûman u toz.
Dinya ma li ber
Dêwê har û reş.

kambaxker e ew
Mêrkuj û keleş;
Ji bo demekê
Cihan ma bi wî.
Dibûne Xwedê.
Di nava wî cî.
Xudakî bêvac,(1)
Xudakî cebbar,
karê wî kambax,
Gelek zînatkar.(2)
Heyhat!
Heyhat!
Vî bayê bêbav,
Cerg û hinav pat,
Bahoz,
Bê doz,
Wekî Ruhistîn
Bi ser me de hat.

---

(1) bêvac: bê mentiq ehmeq
(2) zînatkar: zalim, zorker

Bahoz !

Bahoz !

Rûyê erdê lev,

Bû dûman û toz.

Sitûn bi sitûn

Gihan ber ezman

Ricifîn û lerzîn.

Gihaşte cihan

Boblat,(1)

Boblat...

Ev çi bela bû

Bi ser me de hat?

Çiya û zimag,(2)

Rêl û gov û şag,

Avahî, xirbe,

Bajarr, qesebe,

Dar û ber, giya,

---

(1) Boblat: bela pirr mezin

(2) Zimag: di palên çiyan de cih sersî, ku royê hindik dibîne

Zinar û qefa,
Tev bi hikmê ba
Dilerzin,
Dihezin,
Diricfin,
ji tirsa,
Ji ber ba.

* * *

Çi erd û çiya,
Çi av û derya,
Ji ber hingên(1) bê
Dikevin tayê.
Daran hil dike,
Qefan gêrr dike:
Xanî têne xar,
Dibin tar û mar.
Li rûyê erdê

---

(1) Hing: şelpe, kir an lêdana xurt

Meriv tinawir(1)
Geştî di derya,
Li jor balafirr.
Rê li ber tevan
Winda bûye her
Hin dibin tinne,
Hinek jê sêser.
Hewar!
Eman!
Ji her alî tê.
Deng ji xweyî can
Bi şîn û girîn
Feryad û fixan
Nizan biçin kû
Dehbe û insan?

* * *

Bahoz!
Bahoz!

---

(1) Tinawir: herçî tiştê xweyî can

Cihan reş, tarî
Tev dûman û toz
Rêzana dinê
Li hev xist yekcar
Derya li hev ket.
Çiya hatin xar.
Ev dema hindik
Gelekî dirêj
Hemî şewişîn
Bûne mest û gêj.
Deverrû ketin,
Nema kes rabû,
Ezman wergerrî
Bi ser me va bû,
Cihan ser û bin
Li jêr û li jor,
Tev de bûn xopan
Welat û sinorr.
Hemî sernexûn.
Çi xurt û çi jar,

Li rastekê man
Dewlemend, zîvar.
Ji min ku ne ma
Kesek di cihan,
Ser rûyê zemîn
Tev bû goristan.

* * *

Hînga,
Hê tê ba;
Bakî bê eman
Her dike wêran.
Ji niş bi derket
Peyakî reşkal,
li serî koloz,
Bi şapik û şal.
Hilmiştî, sivik
Û çalak û şeng,
Him bi zend û bend
Xweşmêr û çeleng

Rûgeş û xwîngerm
Gelek sergiran,
Sergevaz(1) û xurt,
Fêris û hozan,(2)
Bi semt û suhun,
Xurtî û tewat,(3)
Berê xwe dida
Navçava welat.
Wek Ristem,
Wek Gudherz,
Bê telaş û bez,
Bi vîn,
Bi şîn.
Di nav kûntarrên
Zaxros dimeşîn.
Berê wî li jor.
Bawermend û xurt,

---

(1) Sergevaz: mezinê bi nav û nas
(2) Hozan: kesê pirr jîr û zana zaninek bilind
(3) Tewat: temkîn, sergiranî

Alek kesk û sor
Bi destê xwe girt.
Ne toz û dûman,
Ne ba û bandef
Nikarin badin
Berî ji hedef.
Bê tirs û perwa,
Bi dilekî geş
Berê xwe dabû
Bahozê keleş.
Welê çû gazê,
Bê ketin û west
Ala kesk û sor
Li darekî best
Berê,
Bi awirr
Berî da cihan.
Dema
Ku wî dît
Hemî perîşan..

Dilê xwe êşand
Wî li ser beşer
Digot: ji bo çi
Bûn hevalê şerr?
Dema ku şerr tê
Tev de dirrevin
Holê deverrû
Nexûn dikevin.
Mixabin!
Çi kirêt!
Serî datînin
Bê şerm û fihêt...

* * *

Ew bayê mêrkuj,
Bahozê wxînxwar
Ku cihan hemî
Dikir tar û mar,
Li pêş suhna(1) wî

---

(1) Suhn: heybet

Reşkalê rûgeş
Paşpê dirrevîn
Ew dêwê keleş.
Mandî xuya bû
Gelek, Ehremen.
Hurmiz ajot ser
Hê jî rû li ken
Piştî ku revand
Wî singa bahoz
Cihan vala bû
Ji dûman û toz
Darê xwe hilda
Bi ala rengîn
Sînorrê welêt
Ji nû ve danîn.

* * *

Pişti ku revî
Ew dêwê keleş

Zivirrî meydan
Dîsa bayê reş.
Lê vêcar bi ten
Xebata xwe kir.
Hilma di derya
Û erdê rakir
Li rûyê ezmên
Wî ewr civandin
Çi reş û çi gewr
Li' hev gerrandin,
Berê
Pirr sivik
Dibarî xunav
Paşê
Giran kir
Daxist tav bi tav.
Çendakî welê
Rûyê erdê şuşt
Qirrêj û gemar
Nehişt tev de mişt.

Ewrên di ezmên
Ava xwe rijand
Rûyê cihanê
Yekerrû divejand.
Kulilk û giya,
Rêl û dar û ber
Tev serî hildan
Şîn bûn seraser.

* * *

Hînga
Di Cihan
Neman pîs.
Tev delal û rind.
Wêran,
Xopan
Ava bûn
Çi bajarr û gund,
Qeliya tovê
Şerxwazên teres.

Neman ew dûpişk,
Mirin ew nakes.
Pişlî mirar bû
Ehremenê mar.
Şewitî di nav
Potên kolîdar.
Rabûn,
Dilgeş,
Yekdest
Karker û cotkar,
Kolan
Gorrek
Pirr kûr
Ji bo kolîdar.
Jê re
Danîn
Kêlek(1)
Mezin û giran

(1) Kêl: kevirê ku di ber gorrê, aliyê serî de dadiçikînin

Li ser
Nivîsîn:
«LI VIR
RADIZÊ ŞEYTAN;»

* * *

Dinya bi xweşî
Ji nû ava bû.
Zîvar, cewêlek(1)
Dilgeş û şa bû.
Rêzan, şêwrewî(2)
Tev aşîtîxwaz
Di nav wan ne man
Birçî belengaz.
Cihan,
Ji nû ve
Holê bû buhişt.

---

(1) Cewêlek: kesê bê erd û xebat ku ji bo xelkê dixebite «pirolêtar»
(2) Şêwrewî: îştîrakî

Delal û şêrîn
Vê car
Dikarin
Reş û gewr,
Sor û zer
Bi hev re bijîn.
Bîjîn
Bi xweşî,
Bi rûmet
Bi şadî û ken!
Hurmiz
Bû serdest
Her û her
Li ser Ehremen(1)

---

(1)Di efsaneyên ola Zerdeşt de dibêjin: Hurmiz û Ehremen ji roja dinê ava bûye bi hev re di şerr de ne, lê dawî Hurmiz dê zora Ehremen bibe û bikuje, jê bi şûnde nema di dinê de neqenc dimînin û nema xerabî dibe.

# BANG

*« Ji bo keç û lawên cihan*
*li mihricana pêncan »*

Ho keçên cihan! lawên sergiran!
Îro hûn civîn dikin mihrican.
Ez pîroz dikim mihricana we,
Dilê min geş kir vê civana we.
Ev civîn, peyivîn, dîlan û govend,
Yekdestî, biratî, ev rêzik û bend.
Tev ji bo aşîtî, heqşînasî ye,
Ev armanc me ji we berê nasî ye.
Pirr sipas ji we re hey lawên cihan.
Li pêş we dibîn im dozek(1) pirr giran
Ew doz.

(1) Doz: dawa, daxwaz.

Doza serbestî û azadiya mirov.
Divê xelas be,
Ji zînata(1) kolîdarê dilreş û hov.
Ew kolîdarê ku,
Bi navê heqperestî, dadimendî(2) û zanîn,
Şûrê zînatê,
Bê dilovanî li ser sitoyê me danîn.
Ji xweşî û serbestî,
Xêr û xêratên welat kirin bêpar!
Ew in zînatkar, ew in diz, ew in dijmin,
ew in nayar...
Wan ji nav me,
Hin dewlemendên guhbel û pîs û teres
Bijartin kirin pêşeng,
Ew ji wek wan kurreder, çilkek û nakes.
Ev herdu serî,

(1) Zînat: zilim, neheqî.
(2) Dadimendî: edalet.

Bi navê dostî û alîkarî û peyman,
Dixwin bê fihêt,
Malê me, erdê me, xebata me, tevî can...
Vê paşiyê Rohelat,
Hişyar bû ji wê xewa kambax û dirêj.
Ji bo azadiyê,
Kefteleftekê(1) gelek mezin dike ji mêj..
Ji her alî,
Welatparêzên bi rûmet serî hildan;
Her dikin bi mêranî,
Şerrê kolîdarê bizdok û xulamokên wan.
Her rojê ew,
Bi sedan û hezaran ji xwe didin kuştin.
Axa welêt a hêja,
Bi xwîna xwe a pak didin şuştin.
Da ku hêja bin,

---

(1) Kefteleft : xebata ku ji bo tiştekî tê kirin, nîdal.

Xweşî û serfiraziya(1) serbestî û azadî:
Ji îro bi şûnde,
Bijîn serbilind, bi dilgeşî û şadî.
Wan divên hêrgiz,(2)
Berdin kolidarên zorker û talanker û diz
Neştiman (3) xelaskin,
Ji xulamokên wan, ên bêbav û xiniz,(4)
Wê dema ku,
Kolîdarê hiz ev yeka han bîr bir;
Ji bo mayîn,
Û firotina pirtalên xwe binêrrin çi kir!..
Ji lewre wan,
Bi navê « tirsa serdestiya komonîst »;
Welatê me yè aş,(5)

(1) Serfirazî : serbilindî
(2) Hêrgiz : herhal, îlla
(3) Neştiman : welat
(4) Xiniz : xaîn
(5) Aş : ji aşîtî, salim

Tijî hesin kir, heye ku we bi: îst.
Rohelata navîn,
Heya ku digehê sînorrê bakurr;
Tev dagirtin,
Ji top û tifing û tang û balafirr.
Ev çekên ha,
Hemî ne ji bo şerrê leşkerê sor e.
Em têgihêştî ne,
Ev hîzebûnî li ser me nema dibore...
Ma kînga ew diwêrin,
Berê xwe bidin leşkerê sor ê pirr lek:(1)
Wan bi çavên xwe dît,
Şelpa karker û cotkar û cewêlek..
Ez ne bawer im qet
Ku îro li dinê hebin ew ker
Qîma xwe bînin,
Bi hilgirtina taştiya(2) Mûsolînî û Hitler..

(1) Lek : deh hezar leşker, firqe

(2) Hilgirtina taştiya yekî: qîma xwe bi aqîbeta wî anîn e.

Ew çek û posat(1)
Tenê ji bo dili û bindestiya me ne.
Va ye em dibînin,
Di destê me de delîl û burhan hene,
Ew tomiganên ku,
Nûrî Seît ji Ayzenhawr sitand
Berê wan çekan,
Li sînga welatparêzên Kurd û Ereb gerrand.
Ew welatparêzên ku,
Girtî, bindest, bêçek û destvala,
Li Sileymanî û Bexda
Baqûba, Neqret-Selman kuştin di çala.
Me ên mayî,
Bi top û tifing û tajangan dilirsîn in
Binêrr çi ehmeqin
Dixwazin şêran bi fitikê birrevîn in!...

(1) Posat : kurd dibêjin çek û posat, yanê silah û zexîra wan.

Azadî,
Zor xweş û şêrîn e gelek biha ye;
Me ji roja,
Heftê çirriyê(1) canê xwe tê da ye.
Ji hîngê ve,
Bi hezaran me şêr û leheng(2)
kirin qurban;
Da ku bikarin,
Bi camêrî deynin hîmê kurdistan.
Kurdistan.
Dê çêbe çiqas ku kolîdar nevê:
Gelê kurd,
Azadîpereste wî her azadî divê
Nehîştin,

---

(1) Heftê çirriyê : heftê oktobirê, roja serdestiya Kamonîstan

(2) Leheng : Mêrxas, betel, ji bêjeya lehî hatiye. yanê wek lehîyê.

Û nahêlin ku ez bêm Werşew,[1]
Têr bikim çavên xwe,
Ji dîdara we keç û xortên bedew.
Wa ye destê min.
ji dûr ve bigirin, biguvêşin bi şadî;
Sonda me digel hev,
ji bo cihan xebat, her aşîtî û azadî

(1) Werşew: Farsofiya, paytexta polonya

# JAN[1]

Hela jan!
jana kirêt,
jana ziravî..
Perritand
Te ji min her,
Cerg û hinav.
Tu Ketî
Nava serê
Milletê min,
Nexweş bûn
Girs û biçûk
Tev mêr û jin.

---

(1) JAN : êşa giran, me li vir nezanî bi jan nav kiriye.

Te berdan
Şaxên di xwe
Heya bi dil,
Te gerrand
Canê di wan
Tev rîş û kul..
Tu jana giran î,
Navê te nezanî,
Bê şik tu neyar î
Bi hogir û yar î
Yarên te neyar in
Bo min wekî mar in
Jehra wan a cankuj
Lêvên wan ê xwînmij
Millet kirin sermest
Nezan dîl û bindest
Qelsok û reben jar
Bindestê kolîdar
Ev bûne hezar sal
Bê rûmet û bê al

Bê gazin
Bê deng
Bê gilî
Bê ceng
Millet xwe sipart
Dost û yarên te
Nivist kele xew
Di nav warên te
Xeweke Kambax
Xeweke dijwar
Bê hêvî ji jîn
Bin destê neyar
Li ser wî kom bûn
Qirrakên leşxwer
Cendek rakêşan
Wekî seg û gur
Melan bi nivîştan
Şêxan jî bi xiştan
Axayên diz
Begên xiniz

Bûn bav û diyên te
Him dest û piyên te
Bin darê kolidar
Em hêlane zîvar
Ji mal,
Ji can,
Ji vîn,
Û raman,
Zorkerên xwînmij
Sofiyên porrgij
Ji bo te piştmêr
Da ku bibin têr
Riça te av dan
Di canê millet
Tu bû ji bo wan
Heyîn û dewlet
Holê li me dan
Ew tîra cankuj
Wan gurên bêbav
Zûriyên xwînmij

Ew gur
Veşirîn
Di kavilê berx
Li me
Badan
Wan felek û çerx
Holê
Em bûn
Dîl û belengaz!
Ji bo
Rovî
Her tewz û tinaz..

* * *

Helá jan!
Jana teres
Jana qirrêj
Dinasim
Dijminê min
Tu yî ji mêj
Piştî me nasî

Em bûne hişyar
Karker û colkar
Belengaz, zîvar
Gundî, bajarrî
Zana, cewêlek
Ji bo şerrê te
Hemî bûne yek
Îro
Millet
Çiçkî pizivî(1)
Zana
Mêrxas
Cih, cih dilivî
Rêzan
Komel
Civîn û Civan
Yekîtî
Tevgerr

(1) Pizivîn : livina hindik.

Bû armanca wan
Dawî
Nasîn
Ku tu yî dijmin
Berî
Dan te
Ji rêyeke kin
Ew dê
Jêkin
Dest û piyên te
Bikujin
Bigurên
Bav û diyên te
Te cih
Nema
Di nava Kurdan
Bimir
Biqeş
Herre nik Şeytan...

# Ji dest bextê reş û hevalên şaş

Çiqas bextê me reş û kirête di nava cihan!
Nemane bindest pepûk û reben ji xeynî Kurdan!...
Ji bo azadî hemî şerr dikin çi reş û çi zer,
Heya bi Mawmaw ji bindestiyê derdikevin der.
Gelek mixabin nizam ji bo çi em xwe datînin?
Vê kêmiya han ji destê neyar giran nabînin!.
Her car bi rengek em tên xapandin dûvik û terrî.
Bê nav û rûmet di nava lingan xwelî û herrî.
Gelek dikêşin bi dilfirehî zînata neyar!
Ji lewre em bûn kole û kolî ji bo kolidar..
Lê ji bona hev gelek jêhatî wek baz û piling,
Bo hilweşandin hemî şareza wek tevr û kuling.

Bûn du hezar sal di nava dinê bê nav û kiyan
Bi hezrîngkêşî dinalin di bin giranbarê han!.,
Çiqas dixwazin vî barê teres li ser xwe rakin,
Herçiyên pêşeng xwe didin alî bi ya me nakin.
Dindar dibêjin: hûn Xwedê-ne nas derketin
ji din!..
Bêdîn dibêjin: we rê şemirand hûn bûne xaîn!
Bi şan û rûmet azadî xwestin bêdîniya me,
Hezkirna welêt sitem nekêşan xaîniya me...
Me nedizanî ku em kurd bi xwe berpirsiyarin,
Gunehê me ye ji bo doza xwe bi xwe neyarin.
Vê bindestiya duhezar salî, gelek serencam,
Sinçi(1) ji me bir, bê rûmet hêlan bûne
canxulam.
Herwekî Xwedê em dane ji bo koletiyê bes,
Bê serhilanin bijîn bi pîsî jîyînek teres!..
Sed hezar tifı li navçava wê heke wa be jîn,
Çêtire mirin, an tişlek kirin, ne holê mayîn..

* * *

(1) Sinçî : exlaq

Ji du hezar sal heya deh salan ew dema ku çû
Me dev jê berda divê ji bîrkin nema bidin dû
Berpirsiyarên wan demên çûyî çûne û diçin
Em gazina xwe ji kurdên îro ên bîrbir dikin
Navê wan bîrbir lê ew xweşbîr in bo welatê xwe
Bo dilxwazekê ji bîra dikin leht û latên xwe
Bi dilpaqijî ji bav û kalan hîn wêdatir in
Ne ji bona xwe: lê ji bo xelkê karin binirin
Bav û kalên me digotin şukur em bûn bisilman,
Ma ji bona çi em ferqê têxin nav Kurd û Tirkan!..
Lê Tirk û Ecem li me ne nêrrîn bi çavên biran
Li me siwar bûn,. xwîna me mêtin wek seg û guran
Qels û pîsên me hildibijartin dikirin pêşeng
Xurtên me kuştin welat ji me çû bê qirrên û deng
Piştî ku em Kurd di hev de ketin bûn hezar kerî

Zana û zîrek bûn destê neyar em man bê serî
Hîn paşê rabûn çend kesên hêja serî hilanîn
Bi şerr û şûreş doza me kurdan didane zanîn
Lê millet ji bo vê şûreşa han ne pêkhatî bû
Ji lewre dijmin zora me dibir î jêhatî bû
Piştî ku darê Ecem û Tirkan serê me şikand
Çend camêrên Kurd tovê şûreşê ji mû ve reşand
Çiqas ku ev tov tev hişîn ne bû; lê hinekî jê
Cihê xwe digirt riça xwe ji nû berdida erdê
Ji her alîkî xortê nû rabûn bi doza welêt
Dest didane hev bi dilekî germ tev agir û pêt
Di wê hîngê de du ramanên xurt himbêz kir cîhan
Li jor şêwrewî, ji aliyê din xwedîsermiyan
Yekê ji bo xwe aşîtî dikir armanc û pergal(1)

---

(1) Pergal : hîm, kok, riç

Ya din şer dixwest di vê riya han didan
gelek mal

Kurdên ku herdem azadîperest bûn aşîtîxwaz

Da serxwe bibin di nav kurdistan geş û
serfiraz

Bi dilekî xurt hengame kirin wan bi mêranî

Ji bo kolîdar, hevalbendê şerr serî dananî

Sergermên di wan bûne şêwrewî yanê
komonîst

Lê zor mixabin hevalên ne Kurd bi eqlê
wan lîst

Digotine wan : ji bona îro bi navê kurdan,

Divê hûn nekin di vî welatî tu peyv û dozan,

Kurditiya we, alîkari ye ji bo kolîdar,

Ger hûn vê bikin dibin xulamok di destê
neyar...

Bi vê gotinê hatine xapîn ew kurdên bîrbir

Doza kurditî di dilê wan de bi carekê mir

Bi vê ramanê dema ku çûbûn Mehrecana geş

Ne bûne xwedî ji kurdîtiyê vegerrîn rûreş
Kesî ji wana nediwêrî ku bêje : Kurdistan,
Welatê min e, ez hatim vira bi navê Kurdan!
Hinekan ji wan kumê xwe veşart bê şerm
û fihêt,
Da ku ne bêjin xwe Kurd dizane, ev e ya
kirêt!...
Ev pîsiya han tev hemî ji bo ku careke din
Ji bo Mehrecan û civangerran ew bêne
şandin!!...
Ho hevalên çak bi vê yeka han qima xwe
anîn
Ji bo van tiştan doza xwe berdan serê xwe
danîn.
Bi we nakeve hûn Paleyên Kurd bi nav û
rûmet
Doza xwe berdan ji bo me kurdan dibe
xiyanet...
Lê ez dizanim hûn hatin xapin kurrên
welat in

Xelet û şaşî we jê dûrnaxin mêrê xebat in
Bibin komonîst, komonîstên Kurd, kurdên komonîst
Di vê riya han dengê me kurdan cihanê bihîst
Ev bûne deh sal li Mosko dijî Mistefa Barzan
Bi şev û bi roj xebatê dikê ji bo me kurdan
Me nedît kesî li destê wî da gotê raweste,
Ji bo gelê Kurd xebatê meke li vir daweste..
Wa ye li Îran welatiyên Kurd bi dilekî xurt
Xebatê dikin, partiya Tode bi destê wan girt
Ew xebata ku li Îran dibî, bo çi ne li vir?!...
Navê Kurd gotin kirine guneh wan divê bimir!...
Lê em naxwazin xwe ji bîrakin divê em hebin,
Herçî naxwazin bila biqeşin ewna tinne bin
Ev bûne sî sal bi şev û bi roj me qîrr û gazî,
Destê me vala, zikê me birçî, pişta me tazî

Bi vî halê han me hişyar kirin çend heval
û yar
Da ku hev bigrin têkevin qadê pêşberî neyar
Çawan dixwazin berê wan badin ji neyarên
wan?
Ji kê re dêhlin hilgirtina vî giranbarê han?!.
Kes nîne îro ku barê kesî hilgire ser xwe,
Divê xortên Kurd vî berê hana bidine ber xwe
Hûn dixwazin ku barê xwe bavên derên ji
meydan,
Wekî nemerdan doza gelê Kurd bispêrin
cihan!
Çihan çi karî ji bo me bikî ku em ne mêr bin
Ji xwe bêhêvî, ji millet bi şik, holê bêkêr bin.
Bav û kalên me xwe sipart xelkê, gaca xwe
berdan
Rûmet û namûs, azadî, felat tev de bi der dan
Dixwazin îro ji nû vegerrin lîstika berê

Doxhefsacê xwe pihêt girêdin bi dûvê kerê.
Em vê yeka han tucaran nakin cihan hilweşî
Divê em bigrin heqê gelê kurd bi zor bi
xweşî
Heke wa nebî, çawan dikarin bêjin em
mêr in?
Daketiyên Med, çêliyên Ristem Guhderzê
şêr in..
Ev riya hana xêrnexwazên Kurd avêtin
ber we
Bi vê yeka han riya rûmetê badan li ber we
Armanca Kurd e divê her bike şerrê kolîdar.
Dûvikên di wî, bên pelçiqandin wekî serê mar
Divê binasî kolîdar kî ye? durvê wî çî ye?
Kolîdar kesê ku welat ji min bi zor biri ye.
Nahêle tê de bijîm bi serxwe serbest û aza
Dibe ji min ew havila erdan bistan û reza
Divê bimînim bê nivîsandin, xwendin û
ziman

Da ku vinda bim ji rûyê cihan bê nav û
nîşan

Çi kesê ku vê yeka han dike kolîdarê min

Divê hergavê bêjim gelê kurd: ev neyarê min

Hûn ne bîrin qet ji bo kolîdar tuwar û
ciyan,

Ne ji rohelat, ne ji roava, nîvro û çiyan,

Zorkerê bêbav li ku bê ditin ew e kolîdar

Dilê wî qirrêj, çavên wî birçî dijmin û neyar.

Ez hêvikarim ku hûn navê Kurd ji bîra
ne kin,

Bi kirên holê dilê neyaran li me şa ne kin.

Kurd rê winda ye nema dizane ji kû biçe ban

Hûn bibin rêber jê re salixdin riya
Kurdistan

Kurdistan tucar nayê sitandin bê west û
xebat

Kesê ne êşî ma qet dibînî azadî, felat?
Armanca kurd e ji bo azadî di qadê mayîn
Kî vê nexwaze ji bo gelê Kurd ew dibe xaîn·

# Feleka Bêbext

Feleka bêbext şikand darê min
Nema kes rûnişt li ber arê min
Ji du hezar sal heya bi îro
Azadî nema dj aav warê min
Zorekerê bêbav bi fend û xapan
Di berhev xistin dost û yarê min
Qenc û çakên min tev dane kuştin
Qelandin riça karguzarê min
Serek û rêber di welêt ne man
Li erdê hîştin Koç û barê min
Ji hev Perçe bû Kurdistana gewr
Ket nava destê çar neyarê min
Kirine guneh bi kurdî peyvîn
Wân divê rakin ziman, zarê min

Dewlemendê min hale şêlandin
Ji welêt derket tev zivarê min
Ew kesên ku xwe mezin dinasîn
Roja teng ne bûn bendewarê min
Çend heb ji wana mabûn di meydan
Îro tev revîn ji ber barê min
Hinek ji wana bê şerm û fihêt
Bi destê neyar bûn sîmsarê min!..
Dixwazin îro bi hîzebûnî
Bi derxin Kurdan ji ber karê min

Qirrak Tot û Kund ketin warê min
Koleyên kolî kolîdarê min!..

Ji xeynî Felek min hene neyar
Li dora welêt bûne çarnikar
Çav dane dîlî, bindestiya min
Bi zorê hiştim bê ziman û zar
Berê rabûn me Tirkên Tûranî
Ecemên guhpêl ... bêwar
Herçî li Îraq û Îran bûyî

Dihêlim ji bo Goran û Hejar
Dê lenê bêjim kurt û serpilkî
Ku çawan Tirkan xwîna me xewar
Ji Tirkan sê kes xudan guneh bûn
Kemal Ata-turk, Îsmet û Bayar
Di nav sî salî ji gernasên Kurd
Sê hezar mêrxas şandine ber dar
Ji Dêrsim, Sasûn, Geliyê Zîlan
Pîran û Licee, Reşkot, Pencînar
Maden û Hênê, Kotol û Hîzan
Mirdês û Botan, Varto û Xizxar
Ji Mûş û Bidlîs, Xarpêt, Hezarrom
Ji Sêrt û Wanê, Amed û Hekar
Du sed hezar kes ji me dan kuştin
Hinek serjê bûn wek pez û dewar
Ji vê jimarê mezin, biçûk, jin
Bi agir sotin bîst û du hezar
Şêst û çar hezar hinartin surgûn
Hinek jê mêrxas, hinek jê maldar

Ev hemî ji bo çavtirsandinê
Heya heqê xwe nexwazin yekçar
Lê van Kirana em netirsandin
Kesên bi rûmet natirsin tucar

Qirrak Tot û Kund ketin warê min
Turkên wehş û hov kolîdarê min

Pirr kûre riça şûreşa(1) kurdan
Holê serpilkî nayê salixdan
Tenê dixwazim rûpelên pêşîn
Kurtebirr bêjim di nav van xêzan:
Berî herkesî ala xwe hilda
Tev leşkerê xwe Ceneral Îhsan
Lê dema felek berî jê gubart
Dakete Îraq vala hîşt meydan.
Piştî wî rabû Şêx Seîdê kal
Tev eşîrên Kurd daket ji Pîran

---

(1) Şûreş : ji bo daxwazekê rabûn, şerr kirin sewre.

Begên malkambax, axayên bêbext
Bûn destê neyar li ser pişta wan
Piştî çar mehan bi şerrên xûnrîz
Ket nava lepê leşkerê Tirkan
Ew şêrê leheng bi dilekî xurt
Darve bû digel çil û heşt mêran
Lê agirê ku Şêx Seîd dada
Cih cih vêdiket li deşt û çiyan
Cihek ji Sasûn, cihek ji Agrî.
Hêlek ji Serhed heya Erzincan.
Dawiya gişkan rabû ji Dêrsim
Şêx Seyid Riza sala sî û heştan
Ji ber ku ne bûn jê re alîkar
Pê ne bû hilde giranbarê han
Piştî gelek şerr, kuştin û mirin
Ala şerr daxist xwe sipart Tirkan
Tevî xelkê xwe bû dîl û bindest
Xurtemêr kuştin, qelsê wan berdan
Çîrroka şûreş gelekî dirêj

Têr nakin jê re ev rûpelên han
Ji me tê xwestin divê bibîrin
Herdem vê yekê bidin ber çavan

Qirrak Tot û Kund ketin warê min
Çêjikên Cengîz Kolîdarê min

# WEFDA KURDÎ

Dibêjin wefdeke Kurdî!
Li ser zînat û sitemkariya Ecem
Nivîsareke dûr û dirêj,
Li Parîsê daye sekretêrê Heyeta Umem!..
Tê de bi ser û ber kiriye
Çêla biserhatiya Kurdên Ciwanrû,
Ku hinde jê hatine kuştin..
Jin û zav û zêç ji ber lingan çû...
Ma kînga heq tête dayîn.. ho?!..
Heke xwedî heq ne dest bi dar be;
Ola wî kirin û mirin,
Dilpola û gurçikzinar be.
Di navbera daxwaz û daxwaz de,

Ferq heye ji erdê heya bi ezman
Reben û parsek tên qewitandin
Her dem hatiye nasîn heqê xurtan.
Qelsî, riya mirin û winda bûne,
Mirinek kirêt, windabûnek bê doz..
Çi gelê xwestiye aza bijî,
Xwe daye nasîn bi zaravayê Bahoz...
Heke we divê heqê xwe bigrin,
Zûka destê millet bighînin dar.
An na, dengê me nayête bihîstin,
Dê bimînin şerpeze, bindest û bêwar...
Agirê serxwebûna milletan,
Divê xebateke xurt û gelêr û yekrû.
Tenê bi pifkirinê vênakeve,
Jê re dixwaze gelek êzing û ardû..
Ardûyê vî agirê han,
Divê em bin, ho.. kurdên camêr û bi rûmet!
Mirin û heps û birçî bûn..

Divê ji me re bibin wek cejn û dawet.
Gava me xwe ji vê da paş,
Dê çawa dengê me bigehê cihan?
Bê şerr û gelş û qirrên û lêdan,
Lingê me naçe nav axa Kurdistan
Cihê ku îro em kurd
Ji bo Ciwanrû bibin piştmêr û gazî,
Bi ser Ecemen guhpêl de bigrin
Bi top û tifing û şûrê tazî.
Ne herwekî qels û rebenan,
Tenê çav bibin peyv û gilî û gazin..
Mehder û alîkarî û piştmêriyê,
Biçin ji zorker û rêbirran bixwazin!..
Ma kî ye ew civata milletan?
Ew in şandiyên çend dewletên kolîdar,
Wan li dora xwe civandine
Peyayên milletên qels û reben û jar.
Herwekî ew dixwazin
Ji xwe re hin qanûn û rêzan danîne,

Naxwazin rastiyê binasin
Ola wan, zor û zînat û pêkarîn e
Rê û doliwa cîhanê,
Goreyî kar û daxwaza xwe digerrin in!
Çi rast be, çi derew be,
Milletên biçûk li pê xwe radikşîn in...
Bi navê heq û dadimendî,
Tovê şerr û zînat û gellaciyê çandin..
Kesê ku qîma xwe pê nanî
Bi ser de gulle û bombe barandin!..
Heke ev ne welê ye,
Çawan Firansiz bi tang û top û tifingan;
Welatparêzên Cezaîrî
Dikujin û dipelçêqin di bin lingan!..
Ma ji bo çi ew koma rêbirran,
Dest nade ber darê sitema zorker?
Heke wê qanûn û rêzan hene,
Çima danade dergehê kuştin û şerr?!...
Ma ne ew Koma qeşmer bû ku,

Leşkerê xwe dişande şerrê Korya?
Da ku bi zora dar û tifing,
Wan têxin bin destê maldarên Emerîka.
Heke ranebûna Maw-Sî-Tong,
Serdarê Çîna gelêr, ew pilingê zer;
Dê Korya tev bibûna Kolî,
Tê de aza nediman tu cih û dever...
Ji hêla din Hind-Çinî,
Dema xwest bibe serxwe û aza;
Bê ku bazgûrî kesî be
Ajote ser kolîdar wekî Baza·
Qet nedihate bîra wan
Ku tu rojan bi lavayî û bergerr û gazin,
Ji wê koma rêbirr û nemerdan
Serxwebûn û azadiya xwe bixwazin.
Bi şerrê Diyan-Biyan-Fû,
Û berî wî bi gelek şerrên xwînrîz û giran..
Şikandin serê kolîdarê pîs,
Bê nav û rûmet kirin di nav cihan.

Ji hemî milletên bindest re
Rave kirin riya serbestî û azadî,
Ku bê kuştin û mirin
Kes nagehê warê rûmet û şadî.
Berî vê pi çar sed salî
Zanayê me Kurdan Ehmedê Xanî,
Riya felat û azadiyê
Ji gernasên îro pirr çêtir dizanî
Dibêje: nedin bîra xwe ku,
Bê ceng û têkoşîn û sergermî..
Ma welat tên sitandin,
Bi bergerr û lavayî û zarnermî?!..
Şerme ku em xwe deynin,
Bazgûrî zorkeran bin û bibazin.
Divê me dar bi dest be
Her bi serê ço heqê xwe bixwazin.
Heke em direjî mirinê nekin
Wek lokê har û hêc û girgîn,
Çawan dê bikeve destê me?

Welat û rûmet, serbilindî û jîn..

—o—

Ho... xortê kurd ê hêja!
Hêviya gel û welat û welatiyên min..
Rabe bi merdî serî hilde,
Şerm û fihêteji bo te îdî nivistin.
Kurdistan, wa ye gazî te dike,
Birû wek şêran biçe hewar û gazî..
Bavê te, dema mirinê
Ji te re hîşti bû şûrekî tûj û tazî..
Lê tenê ji ber qelsiya te
Wî şûrî giritiye qirrêj û pasik û jeng!
Di nava gelên cihanê de
Tu tenê ma ye bê nav û nîşan û deng...
Wekî mêran dest bibe xwe
Wî şûrî hilde rast û çep daweşîne,
Bend û Kemendên di dest û lingên kurd

Pê bibirre û bi carekê bişkênîne.
Guh mede gotinên qelsan
Dê wek tiryaq laşa te bitevizînin,
Hevaliya wan şermisari ye
Dê rehên mêraniyê di te de bimirînin...
Derdê te m zin; lê ne bê derman e,
Birîna te bêteşe, gelekî kûr...
Ji min bibhîse şîreta biran
Te nînin derman, bê tifing û şûr.
Heke neyarê me yê zorker
Çiqasî xurt be, xudan keştî û leşker,
Bê şivîşk dê zora wî biçe,
Heke di nav me hebin sergevaz û rêber.
Ez bawer im ku hûn xortên kurd.
Li bende kêsa xwe mane rawestî...
Dê hemin serê xwe hildin
Qet bi we nakeve ev qelsî û bindestî!.
Ez bi hêviya wê rabûnê,

Bûn sî sal naxwazim darê xwe bavêm;
Heke bi rûmet û azadî ne bû,
Ez vê jîna derbeder û bindest navêm.

# HO XORT

Ho xort !
Xortê Kurd,
Pêşengê xebat,
Hêviya welat,
Kurrê bav û dê
Ji bo azadî,
Ji bo serbestî,
Bi şev û bi roj,
Me divê xebat,
Heval û hevrê
'Azadî, bi dûrketine..
Berî her tiştî,
ji her ramanek,
Ku me bi dûrxe,
ji armanca me.

Heya em navên,
Ramanên cankuj
Di nav serên xwe,
Çawan sar dibe,
Ev tivanca me.
Hin ji me,
Bawer in ku,
Azadiya weřêt,
ji neyaran,
ji zorkeran,
Ew e serxwebûn.
A rast,
Çi ramanek kevn
Çi ramanek nû,
Ku me girêde,
Me dike kolî,
Ew e winda bûn.
Divê em,
Berî her tiştî,
Bi nêhrîna xwe,

Bi ranana xwe,
Aza bin serbest.
Çiqas em,
Bêne girêdan,
Bi ramanên xelkê,
Li ser riya wan,
Dê bibin bindest.
Bo çi tu?
Xwe qels dibînî,
Kêmtirî xelkê,
Dûvik û terrî,
Şermende,
Reben û bêkêr.
Çi roja,
Ku bûye şerr,
Ku bûye ceng,
Tu dibû serdar,
Tu bû nijdevan,
Her tu bû piştmêr.
Ji bo çi?
Tu bikî,
Xelk bixwe,
Her ji keda xwe,
Bimînî bêpar!..

Ji dilpakî,
Bı dilqencî,
Bèyî xapandin,
Bimînî li paş,
Xulamê neyar.
Bese, Ho
Çavê xwe veke,
Da ku carek din,
Wekî her carê,—
Neyî xapandin.
Baş binas,
Riya xwe,
Armanca millet,
Da giyanê kurd
Bête vejandin.
Azadî,
Ji bo te
Ku bi tukesî,
Bi tû ramanan,
Neyî girêdan.

Yekarmanc,
Yek rêzan,
Yek raman,
Xebatê bikî,
Ji bo Kurdistan.
Ji bo îro,
Ev gotin besin,
Heke zanibî,
Ji min bibhîse,
Şîreta biran.
An na,
Dê bê xapandin,
Ji dilpaqijî,
Bibî part ji bo,
Rovî û Guran.

# Rupelê Xeletan

| Rûpel | Xez | Xelat | Rast |
|---|---|---|---|
| 3 | 9 | Neval | Newal |
| 4 | 6 | Di kin | Dikin |
| 39 | 7 | Xaîm | Xaîn |
| 40 | 9 | binirin | bimirin |
| 46 | 14 | binanî | binasî |
| 54 | 6 | knrdên | kurdên |
| 56 | 11 | çav bibin | çav bidin |